Maahanmuuttovirasto
Migrationsverket
Finnish Immigration Service

TURVAPAIKKA-, MAAHANMUUTTO- JA KOTOUTTAMISRAHASTO

Euroopan unionin tuella

# Lêpirsîna penaberiyê ya zarokên li gel malbatê hatine bi riya vîdyoyê

Tu hatî gazîkirin bo lêpirsîna Daîreya Koçberan. Ev şîret behsa maf û peywirên te di lêpirsînê de dike. Wê li gel dêbavên xwe baş bixwîne. Eger pirsên te hebin, ji dêûbavên xwe yan di lêpirsînê de ji kar-mendê Daîreya Koçberan bipirse.

## Armanca lêpirsînê çi ye?

- Malbata te dawa penaberiyê li Fînlandayê kiriye. Di lêpirsînê de dê wan sebeban ji we bipirsin ka hûn çima dawa penaberiyê ji Fînlandayê dikin û çima nikarin vegerin welatê xwe.
- Dêûbavên te di lêpirsînên xwe de sebebên xwe û yên malbatê bi giştî bo dawa penaberiyê dibêjin.
- Armanca vê lêpirsînê ew e ku imkanê bide te ku behsa tiştên bo xwe muhim bikî. Tu dikarî behsa wê bikî ka çi bi serê we hatiye yan tu çima ditirsî. Giring e ku tu behsa hemû sebebên heyî di vê hevdîtinê de bikî. Bi serbestî gotinên xwe bibêje. Eger hewce bike, lêpirsker dê pirsan ji te bike.



1.6.2025 – kurmandzi
Asiakasohje: Perheen mukana hakevan lapsen turvapaikkapuhuttelu videoyhteydellä

## Di lêpirsînê de çi maf û berpirsiyariyên te hene?

- Dêûbavên te bi awayekî giştî di lêpirsînê de li gel bin. Bîskekê dê bêyî wan jî lêpirsîna te bikin.
- We maf heye di lêpirsînê de parêzer an avukat bi kar bînin. Parêzer bi xwe biryara beşdarbûna xwe dide.
- Dêbavên te eger hewce be avukatekî peyda dikin. Eger dêbavên te avukatekî peyda nekin, em dikarin lêpirsînê bêyî avukat jî bikin.
- Di lêpirsînê de terciman heye. Karê terciman ew e ku her tiştê gotî bi bêalîtî wergerîne. Terciman dikare li wî cihî be yan jî li ser telefonê yan vîdyoyê be.
- Lêpirsker, terciman û parêzer xwedî wezîfeya parastina surran in anku nabe ew tiştên di lêpirsînê de bihîstî bo kesên din aşkere bikin. Belgenameyên li ser doza te bi surrî tên parastin. Em dikarin tiştên tu behs dikî ji endamên malbata te jî veşêrin eger aşkerebûna wan dibe ziyanê yan metirsiyê bigihîne te yan kesûkarên te. Dikarî di lêpirsînê de nêrîna xwe li ser bibêjî.
- Rastiyê bibêje. Eger tiştekî nizanî yan neyê bîra te, hewl nede ku bersivekê ji bal xwe ve çêkî. Dayîna agahiyên nerast dikare bibe sebebê bawernekirina ji dawa te.
- Di lêpirsînê de nav û dema jidayikbûna xwe rast bibêje. Eger bixwazî paşî nasnameya xwe biguherînî, hewceyî pasport yan nasnameyeke resmî yên hikûmî biguherînî.
- Daîreya Koçberan agahiyên nasnameya te di sicila karûbarên biyaniyan de qeyd dike ku tomareke hikûmî ye û di meşandina karûbarên dawanameyên te dixebitîne.
- Dayîna agahiyên nerast yên nasnameyî bo karbidestan û agahiyên şaş bo tomarên hikûmî tawan e û tê cezakirin. Li Fînlandayê berpirsiyariya tawanan li ser kesên bûyî 15 salî ye.

## Çawa xwe bo lêpirsînê hazir bikî baş e?

- Berî lêpirsînê hemû şîretên karbidestan dayî te li gel dêûbavên xwe bixwîne. Giring e ku tu belavokên derbarê rêkarên Dublînê binasî. Eger ew belavok li ba te nebin, dikarî wan ji malpera Daîreya Koçberan peyda bikî: migri.fi/esitteet-ja-julkaisut. Belavok li bin sernavê "Turvapaikka ja Dublin-menettely" (Penaxwazî û rêkara Dublînê) ye.
- Eger ji ber sebebek maqûl hêvî bikî ku terciman an lêpirsker jin an mêr be, berî roja lêpirsînê bibêje karmendekî kampa xwe. Karmend dê hêviya te bigihîne Daîreya Koçberan. Daîreya Koçberan biryar dide ka sebeb maqûl e.

- Eger tiştek di saxiya te de hebe ku tesîrê li ser lêpirsînê bike, bibêje dêûbavên xwe yan karmendekî kampa xwe. Karmend dikare bi izna te yan ya dêûbaên te berî lêpirsînê wê bibêje Daîreya Koçberan berî roja lêpirsînê.

## Roja lêpirsînê wiha bike

- Nikarî bêyî sebebekî rewa dema lêpirsîna xwe paş bixî. Eger roja lêpirsînê nexweş bî, yekser navenda pêşwazîkirina xwe agahdar bike. Divê tu gotareke hemşîreyan yan bijîşkan derbarê nexweşiya xwe bigihînî Daîreya Koçberan ne derengtir ji 1 hefteyê ji roja lêpirsînê ve. Eger bêyî sebebeke maqûl li lêpirsînê hazir nebî, dikarin bêyî lêpirsînê biryar were dayîn.
- Tenê kesên gazîkirî dikarin bên avahiyê Daîreya Koçberan û kesên ku biryar li ser hatina wan li gel te hatiye dan dikarin werin.
- Eger bixwazî alîkarek li gel te bê, ew yan nûner dikare pêştir bi nivîskî ji Daîreya Koçberan daxwaz bike. Wek din lêpirsker biryarê dide ka alîkar dikare beşdar bibe yan na. Alîkar ne parêzer e û beşdarî ronkirina meseleyê nabe.
- Lêpirsker karmendekî Daîreya Koçberan e.
- Dengê lêpirsînê tê qeydkirin. Li odeyê herwiha kameraya çavdêriyê ya qeydker heye.
- Eger hewce be bêhnvedan di lêpirsînê de tên kirin. Bibêje eger bêhnvedanekê bixwazî.

## Di lêpirsînê de çi dibe?

- Destpêkê lêpirsker dibêje ka di lêpirsînê de çi dibe û piştrast dike ku tu maf û peywirên xwe fehm dikî. Bipirse eger tiştekî fehm nekî. Bibêje eger ji terciman fehm nekî.
- Lêpirsker pirsên giştî derbarê jiyana te li welatê te û li Fînlandayê ji te dipirse. Ew paşî ji te dawa dike bibêjî ka çi bi serê te hatiye û çima nikarî vegerî welatê xwe. Herwiha ew dê pirsên deqîqker derbarê wan wan tiştan dipirse ku behs dikî. Bi rastgoyî bersivê bide. Bibêje eger tu nizanî yan nayê bîra te.
- Daîreya Koçberan dikare di lêpirsînê de derbarê mijarên tesîrker li ser biryarê ji te bipirse. Bo nimûne, eger şik hebe ku te li Fînlandayê tawanek kiriye yan tu hatî hukimdan, dibe ku tesîra wê li ser biryara Daîreya Koçberan hebe. Daîreya Koçberan di lêpirsînê de derfet dide ku tu nêrîna xwe li ser bibêjî.
- Lêpirsker li ser kompûterê dinivîse wan tiştên ku di lêpirsînê de tên axiftin. Navê wan têbîniyan bîrname ye. Lêpirsker li ser kompûterê dinivîse wan tiştên ku di lêpirsînê de tên axiftin. Navê wan têbîniyan bîrname ye. Hevpeyivînker bi riya vîdyoyê lêpirsînnameyê bi re bi temamî yan beşeke wê dixwîne eger bi nêrîna Daîreya Koçberan hewce be. Eger hevpeyivînker bi te re bîrnameyê bi temamî

nexwîne, rojeke diyarkirî dide te ku dikarî heta hingê verastkirin û lêzêdekirina bişînî. Bîrname bi posteyê ji dêbavên te re tê şandin.

## Daîreya Koçberan çawa biryarê dide?

- Li ser dawa malbata we dibe ku mafê penaberiya navneteweyî yan îqameyê bidin we
- Daîreya Koçberan biryarê li ser agahiyên te di lêpirsîna penaberiyê de dayî û belgeyên din yên pêşkêşkirî dide. Di biryardanê de Daîreya Koc_beran guhdariya gotinên te jî dike.
- Eger dawa we bêt redkirin, dikarin we vegerînin û hatina bo Fînlandayê û welatên din yên hevpeymanên Schengenê li we qedexe bikin.
- Eger te sebebekî nû bi dawakirina penaberiyê hebe piştî ku biryara Daîreya Koçber li ser dawanameya te bigihe hukmê qanûnê, di zûtirîn demê de dawayeke nû bike. Divê ku sebebekî maqûl hebe ku çima te berê behsa wan sebebên nû nekiriye. Sebeb divê tiştekî wisa be ku ne di bin tesîra te bi xwe de be. Piştî hingê Daîreya Koçberan dê lê binêre ya dawaya te qebûl bike yan na.